# Ji Tefsira Qur'anê

(Beşa Duyem)

Kamran **Elî Bedirxan**

**Amadekar: Sedat Ulugana**

193- Gelo misrikîno.. pûtên me ko îmê hiviya hevkerî
xwedê û ji Xuda pê re ji man re jî îbadetê dikin,
bizanin ko ew ne mexlûq in, belkê hon dibirast in bi 200. Jên ko ji Xuda tirsiyar in, hergava dikevin/Şeytan wesweseya bi
banê man bikin û bila ew ji me re vegerînin.

194- Ma destê wan yigên pûtên me hene ko bimeşin, destê man
hene ko bigirin, çavên man hene ko bibînin,
guhê man hene ko bibihîsin?
Bêje: banê pûtên xwe bikin, bila/di hevê min de hev(?)
ji destê man te gunda me bikin, ez ji me ji man ji
Xudayê xwe tirsiyar im.

195- Delîl û wermiyarê min Xudayê, yê ko Quran da da
û Siltan padişahê benermend û qencîkeran hemî ew

196- Pûtên me ko hon ji Xuda pê re îbadetê ji man re ji
îbadetê dikin/ bizanin ko nikarin ne arîkariya xwe û ne jî arîkariya
me bikin.

197- Gava tu banê manfikirê û diluje man bikenin riya
rastiyê, ew na bibihîsin û tu mêze dikî ko ew li te mêze
dikin, lê/te na bînin.

198- Ji aûcin xelkê bibore, bi pêkanina xêyr û qenciyê
şîretan li xelkê bike û ji nezan û sefîhan rûyê xwe/ bizi
dur ji man bide.

199- Hekke Şeytan wesweseyê dixwaze te bixapîne

ji riya Xuda derîne, ew Xuda bike bira xwe û arîkariya wî
bixwaze, Xuda bihîstiyar û zana ye.

200. Jên ko ji Xuda tirsiyar in, hergava dikevin/Şeytan wesweseyê li
man dike, dixwaze wan bixapîne, Xuda tîne bîra xwe
arîkariya wî dixwazin û çavê wan ve dibe, hû dibin û ji destê Şeytên
difilitin.

01- Şeytan birayên xwe kafiran kêşin rêkê çaş ûl(?) ber(?)
de dimeşin û nikarin ji derkevin.

02- Hekke tu ji man re ayetekî nû ne anî, ew ji te re dibêjin:
te çima ji xwe re ayetekî çênekir? Bêje: ayetên ko
ez ji me re tînim, mehyên Xuda ne, û ez di riya Xuda de
li gora emrê Xuda dimeşim, ayetên Xuda ronahiya dila ye,
ji man rastî û nerastî ji hev dibin û mirovên ko baweriya xwe
bi man tînin dighîjin rehmet, qencî û rastiya/ dînê Xudê.

3. Gava Quran tê xwendin [illegible] maxêrin, guh
bidinê, bibihîsin da ko bighîjin rehm û qenciya Xudê.

4- Pêxemberê min, ji dil û can/ bi dil û nizmî/ sihê û înanê
Xudanê xwe bîne bîra xwe ji tirsiyar bibe û bi ko dengê xwe
bilind bike navê wî zikir bike û ji wan mirovên ko Xudanê
xwe ji bîr dikin me be.

5- Yên ko li ba Xuda ne, li ber Xudê arî na bin
[illegible] ji wê re perestiya dikin/ dikin Xudê.
[illegible] dia û û ji Xudê re secde
1.1.

ko bi kirina ... gunehkar ne bibûn | şûnda nekirina mesînaniyê dikirin got:

63- ~~Zîrekî ji Isrêlî~~ digot: ~~Xuda ..~~ hon jî bi miletekî ko Xuda wê bi cezakî giran wî biêşîne, ... çima ~~bi~~ şîretan ~~bi wan~~ dikin?

Wan got: me bi vî karayî mazereta xwe şanî Xudanê xwe didin, ... heye ko xelk gund ji Xudayê xwe tirsiyan dikin û dest ji mesînaniyê dikişînin.

164- Gava ~~yên ko~~ wan yên ko masîvanî ~~li~~ dikirin / ji ... gubi li şîreta şîretdêran ne dan, me şîretkerên riya qenciyê ji nav wan xelas kirin û yên mayîn seba fesad û meçeziya wan bi cezakî giran êşandin.

165- Hemkî wan dest ji mesînaniyê ne kişandin, em ji rehm û piyeniya me dûr ketin û me ji wan re got: bibin meymûn û ew sefîl û şerpeze bûn.

166- Bîne bîra xwe... Xuda emir kiriye ko ewê heta roja piştdawiyê ~~bi lewştî~~ bi belayên kuştin û mihaceret û ... cizye û hokiyê şermiyar û şerpeze bikin [ Xuda gunehkaran ko û bez diêşîne û toba tobedaran qebûl û wan efû dike, Xuda ~~dilovan û~~ ... bexşînde û dilovan e.

167- Me wan li dinyayê belav kirin. hin ji wan haveniya xwe bi Bezma Muhemed anîne û / ji ... ew qenciyê kirin û hinen din haveniya xwe ~~ne~~ anîne û hemermend ne bûne, em car wan / bi qencî û / xirabiyê ~~diştidînin û~~ diceribînin û wan diçidînin heta ko ew vegerin ser riya Xuda a rast.

168- Selfê ko piştî wan hatin her çend ji [ Tewrat ji wan re ma bû û ew bûne hikmên wê bû bûn ji bo xatirê ... ji bav û kalê wan

çend peran hikmên Tewratê ~~diguhêrin~~ diguhartin û ~~dikeşin~~ digotin, Xudan de gunehên me dibore û her çi ji wan re dest daye hewan be helal be heram be, dikirin berika xwe, Me wan li gora hikmên Tewratê sozek ne da bûn ko di heyê Xwedê de rastiyê bêjin û wan Tewratê de ew tişt xwendine û hikmê Tewratê bûne ... seh kirine; ji bona mirovên ko ji Xudayê xwe tirsiyan in mala xweşti mala axretê ye, gelo ew ... bûne

169- Yên ko li gora hikmên Kitêbê dimeşin û nimêja xwe bi şertên wê pêk dikin pêk tînin divê bizanin ko em xewalê qencikaran winda na kin.

170- Me çiyayê Tûrê wek sîbekî giran di ser serê wan de rakirandin û wan hanedikirin ko ew çiya wê bikeve ser wan, me ji wan re got: tiştê ko em didin we bibin û hûnê hikmên wê bikin, qedrê Tewratê bigirin û li gora li gora emirê wê bimeşin heta ko hon ji Xuda tirsiyan bibin.

171- Wê demê bîne bîra xwe... ~~ko emirê Xuda~~ gava ji pişta Adem ~~û~~ ~~Adem û gavana zirêtbûna mirovan~~ [ji pişta Adem] ... ~~dawî heta hanî û~~ û ewqas mirovên ko Tirê bêne afirandin bi emrê Xuda hatin pêşiya wî, Xuda go ... wan: Ez ne Xudanê we me? Wan got: belê, ûem şahid in ko tu Xudanê me yî.

Me wisa kiriye heta ko em roja dawî piştdawiyê de ~~me~~ bêjin, ~~em~~ me agahî ne hatiye, em jê bêhay bûn.

---

~~hey ... di kitêba xwe Tewrat û Incîlê de ...~~

56- Yên ko [ bûn destiya pêxemberê min Muhemed ~~dikin~~ yê ko bi xwe nezan e li bi mehyên min riya rastiyê şanî xelkê dide, dikin û ji xwe ~~ew~~ wan di kitêbên xwe Tewrat û Incîlê de dêbînin / hatina wî ditine, bila bizanin ko Muhemed ji / wan re li kirina qenciyê û / li ne kirina xirabiyê emir dike û xwarina tiştine baş / ji wan re helal û xwarina tiştine kirêt û kirina tiştên bêkêr jî ji wan re heram dike û ~~Barê wan sivik Bi emrên Muhemed barê wan sivik~~ ; ew hikm û qeydeyên dinê wan ên giran sivik bike.

Yên ko haveniya xwe bi / pêxemberitiya wî tînin, qedrê wî digrin, / arikariya wî dikin û li gora emrên Quranê ko jê re hati daxistin dimeşin ew ji ezabê dojehê xelas dibin û digihin buheştê.

157. Pêxemberê min bêje: Geli mirovino... ez pêxemberê Xuda me ~~havniya me~~ me û ji bo we hemiyan hatime, Xudayê ko xwediyê milkê erd û ezmana ye, ji wî pê ve tu Xuda nîne, yê ko sax dike nedijîne û yê ko dimirîne ew e, jî haveniya xwe bi Xuda û pêxemberê wî bînin ... ko bi xwe nezan e û bi mehyên Xuda riya rastiyê şanî xelkê dide – bînin her wekî pêxember jî haveniya xwe bi Xwedê û emr û kitêbên wî anîye, ~~bînin~~, bindestiya pêxember bikin li gorî emrên wî bimeşin ta ko hon bigihin riya rastiyê.

158- Ji qewmê Mûsa bûrek: heye ko / riya rastiyê / û hikmê xwe li gora edaletê dikin. ... xelkê digehînin ... li gora emirê Xuda dimeşin

159- Me lawên Israil kirin dwanzde bar û her yekê ji wan bû miletekî mezin, gava Mûsa ji bo xelkê xwe av xwest, me jê re wehî kir û got: bi çoyê xwe li vî kevirî bide, wî bi çoyê xwe lê da, ji mişkê ve ... ji wî kevirî dwanzde kanî der bûn û her bûrê xelkên Mûsa dolavê di xwe nas kir û me di germiya deşta Tîhê de bi ewrê sîh da we û me ji we re gezû û kutefi da daxistin û me destûra xwarina wî zadî pak da we; we bi serhişkiya xwe zilm ne li me lê ... li nefsa xwe dikir.

160- Bîner bîra xwe, me ji wan re got: bikevin vî gundî û ji zadên wî bi qasî daxwaza xwe bixwin, jî ~~ji Xudayê xwe ... dixwaze bibin û efûa gunehên xwe bixwazin~~, ji deriyê wî li ser çokan dubaz bin û bi poşmanî bibin tobedarên gunehên xwe ta ko Xwedê jî toba we qebûl bike, ji bo ko xwe xwesiya mirovên qenc bêtir dike.

161- Ji ~~wan~~ yên ko ezabdarê nefsa xwe bûne gotina ~~me~~ guhertin û pê ... ji ezmanan ... me / belayek mezin bi ser wan de anî ji ber ko wan zilm dikir.

162- Pêxemberê min... ji wehiyan ji halê xelkê gundê ~~ko~~ di lêva avê bi pirs e, xelkê wî gundî her çend ji masîvanî di roja şemiyê de heram bû lê wan masîvanî dikirin, masî li temê di roja şemiyê de ... seba filsq ... gunehkariya wan lêva avê dibûn û di rojên din de ne dihatin ditin û me / em wan bi vî awayî diceriband û diçidand.

146- Yên ko dunu bi ali ayetên me re dane û roja axiretê inkar kirine amelê wan ên qenc jî di axiretê de bi kêrî wan na yê. Ewê li gora kedê xwe berpirsiyar bibin û ezabê bikişînin.

147- Piştî ko Mûsa çû û ciyê xwe kirê û ji Xudayê xwe re ibadet dikirin qewmê wî ji miletê Fir'ewn golikek ji zêrkêşan golikekî bir ji ku golik bi awakî hat bû çêkirin ko ji dengê wî deng dihat. Ma wan ne didît û bîr ne dibirin ko wê golikê bi wan re xeber ne dida û nikarî bû riya rastiyê şanî wan bide; lê wan ew ji xwe re kir Xuda û ji zaliman bûn.

148- Gava ew ji ibadeta golikê poşman bûne û wan zeh kirin ko o riya xwe şaş kirine û wan got: heke rehmet û yariya Xuda ne gihê me û Xudê di gunehên me ne bore em ji ziyankaran dibin

149- Gava Mûsa vegeriya ba qewmê xwe enirî û xemgîn bû, got wan: piştî çûna min we çi işekî xirab kir, cima bez hewîdarê emrê Xudayê xwe û vegera min ne man? Mûsa Rupelên Tewratê ji destê xwe danî erdê û destê xwe avêt birayê xwe û porê wî girt û kişand. Harûn got: kurê diya min, miletê min ez jar kirim, wan ez bikuştama, qedrê min me şkînine û bi me de ko xelk li hev kenin me şa bikin, û ji min me zêyde û bawer me ke ko ez ji zaliman im.

150- Mûsa got: Xudanê min di gunehên min û birayê min bibore û me bigihîne

rehma û yariya xwe, yê dilovantir tu î.

151- Yên ko golikek birin û ji xwe re kirin Xuda di axiretê de bi ezabê Xuda wê bêne êşandin û di dinyayê de jî sefîl û rezîl bibin Xuda cezayê derewkeran bi vî awayî dide.

152- Lê yên ko xirabî kirine û piştre tobedar bûne û bawerî ya xwe anîne bi dilê bizanin ko Xudanê te di gunehên tobedaran dibore, Xuda dilo

153- Piştî ko erna Mûsa borî, rupelên Tewratê bilanî, di wan rûpelan de ji bo mirovên ko ji Xudayê Xudanê xwe ditirsin rêgiriya şîret û rehmeta Xuda û riya rastiyê nivîsandî bûn.

154- Mûsa di dema ko me jê re anî kirî bû ji qewmê xwe heft mirov bijartin, û gava ew mirovên ha ketin recfa erdhejê girîan Mûsa got: Xudanê min, heke te bixwesta berê ji, gava ko wan ji golikê re ibadet dikirin, dikarî bû min û wan helak bikirî, sebra gunehkariyên qewmê me dixwazî me.

Ev bi hikmeta te ye ku nezaniya wan emrê te ye, te dixwest û ew neban man, riya her kesê ko dixwazî şaş dikî û her kesê ko dixwazî digihînî riya rastiyê, delîl û xweşiyan me tu î, di gunehên me bibore, me bigihîne dilovaniya xwe, efûkarê çêtir tu

155- Di dinyayê de û axiretê de qencî û xweşiyê bike para me, ji kerema xwe bigihîne behiştê û bi rastî em vegerin ba te. Xuda got: ez bi ezabê xwe her kesê ko dixwazim diêşînim û rehm û yariya min dora her tiştî digire, ezê di gunehên mirovên ko ji min ditirsin, zekatê xwe didin û bawerî bi ayetên min anîne bibûrim, ew ji rehm û yariya min

---

136- Me ji lawên Israîl re ko di destê Fir'ewn de jar bibûn (dîlbûn hesirbandin) xwe kirin xwedî rojhilat û rojavayê Şam û Misrê, welatên ko me mîyeda kiriye û bereketa lawên Israîl xudansebû bibûn ditin ji bo gotina Xuda hate cih û me qesr û avahî serayên bilind ko Fir'ewn û miletê wî ava dikirin kirî bûn hilweşand.

137- Me bi selametî lawên Israîl ji avê derbaz kir û gava ew gihaştin welatê miletekî ko pûtperest qewmê wî welatî ji Misrê ji pûtê xwe re perestiş dikirin, nezanên lawên Israîl ji Mûsa re got: heke tu ji me re jî pûtekî weke pûtên vî miletî biafirîne ko em ji re perestiş bikin. Mûsa got: we nezanî di riya Xudê de sekinîne, hon miletekî nezan in;

138- Halê û dawiya wan pûtperestan xirab e û emelê wan bikêr e.

139- Mûsa ji lawên Israîl re got: Ma hon ji Xuda pê ve xudayekî dixwazin, Xuda we ji hemû miletên din çêtir girtiye.

140- Bînin bîra xwe .. me hon ji destê Fir'ewnê ko zorê li we dikirin, kurên we dikuştin û dot û keçên we dihiştin xelas kir; Xuda hon bi wan ezabên giran diceribandin bi hewayekî mezin dicriband.

141- Me ji Mûsa re ciyê sî şevan hetta ko rojiyê bigire û me jî ye deh şevên din jî ser miletê wî kir û temam kir û pê miletê wî temam kir û Mûsa ji birayê xwe Harûn re got: tu bibe nivînendeyê min, qenc be qenciyê bike û me kevne riya fesadkaran.

142- Gava mihleta Mûsa temam bû û anderg û axaftina Xuda

bihîst got: Xudanê me ji kerema xwe berdê ezê te bibînim.
Xuda got: tu nikarî min bibînî lê mezeke pêşiya xwe, wî çiyayî dibînî, heke ew riya cihê xwe de ama tu jî min bibînî, û gava Xuda di ser wî çiyê re dubare bû çiya perçiqî, dengekî mezin ji çiya hat ji tirsa rabû û dilê Mûsa borî û ket erdê. Piştî ko Mûsa gava Mûsa hişê xwe hat got: Xudanê min, tu mezin î, min ku kiriye ko tu na yê dîtin, ez tobedar bûme û bawermendê pêşîn ez im.

143- Xuda jê re got: Mûsa, bi axaftina min û bi pêxemberiyê min tu ji hemû mirovan çêtir girtiye; tiştên ko ez ji kerema xwe didim te bibe û ji şikirdaran bibe.

144- Me ji bo Mûsa di Tewratê de li ser her tiştî şîret û pendên me û hikmên dîn û dinyayê bi tefsîla wan nivîsandiye; Mûsa tu wan bi dilekî xurt û pak bibe û ji qewmê xwe re emir bike bila ew jî li gora hikmên Tewratê bimeşin. Ezê ji dawiya fasiqan gunehkaran şanî we bidim.

145- Ezê yên ko di dinyayê de bê rê xelkê diêşînin û dieşînin û mefsûresiriyê dikin na gihînim ronahiya ayetên xwe, ji xwe heke ew hemû ayet û delîlan bibînin ji baweriya xwe bi wan na yên, riya rastî û qenciyê pêş xwe de peyda bikin ji nakevinê (ti de na meşin) heke reyekê xwar dibînin dikevinê ji ber ko wan durew bi ali ayetên me re dane û bala xwe na dane riya rastiyê, ji bîr na bin, ji bêhay in.

2- Fîrewn got: Beriya izna min we baweriya xwe bi wî anî?
Ev hîle/seh dikirin, we sor û qerara xwe bi Mûsa yek kiriye
ku ta ku hon gewrê mezin melatî ji erdê wî derînin û ê/bikevin
melatê wan, hemî bibînin ezê çi ji we re bikim.
3- Ezê destê we î rastê û l piyê we î çepê jê kim û piştre we
hemî bi dar bikim.
4- Wan got: bimêre, emê vegerin ba Xudanê xwe.
5- Em bê sûç in, gunehê me ew e ko me baweriya xwe, bi ayetên
Xudanê/ ji me re hatine/ aniye û ji ber vê yekê tu tola xwe
ji me bistînî, Xudanê me, sebir bide me, dilê me bişidîne
û me misilman bimirîne.
6- Mezinên qewmê Fîrewn jê re got: Ma tu berdidî ko Mûsa û mileti
wî di vî de fesadiyê bikin û dest ji te û ji Xudayên te berdin?
Fîrewn got: emê Kurê wan bikujin û dotin wan bihêlin
û emê wan bizin/bindest bin destê xwe.
27- Mûsa ji qewmê xwe re got: hêvîdarên Xuda bibin û sebir bikin, erdên dinyê
milkê Xuda ne, bi gora daxwaza xwe ji evdên xwe ji kijkî/re
dixwaze dide, di dawiyê de yên ko ji Xudayê xwe tirsiyan in serdest dibin.
28- Wan lê vegerand û got: berî hatina te em Fîrewn em diêşandin û
piştî hatina te jî ew me diêşîne. Musa got: heye ko/ dijminên we
wî biedimînê bifetisine û erdê wan bide we lê dixwaze
hun bizane we bicerbîne û emelê we nas bike.

129- Me ew, baran û zad û fêkiyên miletî Fîrewn kêm kir. û
ew pê şidand bila ko ew çavê xwe vekin û bîr bibin.
130- Gava miletê Fîrewn qenciyek didît digot: ev heqê me ye,
û gilîndan ne dibûn, lê gava xirabiyek bi ser wan de di hat/ digot: ev şeameta Mûsa
û peyayên di wî ye, wan seh ne dikir, ko qenc û xirabî bi emrê Xuda
çêdibin, ji xwe piraniya wan nezan in tê na gehin.
131- Wan ji Mûsa re got: bi her çi mûcize jî çêkî em bi sihra te
na yên seft kirin û em baweriya xwe bi te na yênin.
132- Ser wî me/ bi ew bayên xurt û lehiyên dijwan
û bi belayê kulî, qumil, beq, mişk û ji dandî ava wan kesor û
xwîndar kir (bi xwîn) lê wan nefsmezinî kir, ew miletê
asî û gunehkar bû.
133- Û gava mesaxiyeke giran bi ser wan de hat/ ji Mûsa re gotin:
Mûsa.. ji Xudanê xwe ko man heyna te û wî da ey ehdeke
heye/ dia ji kor bike ta, ko em ji vî mesaxiyê xelas bibin,
ko em pak bûn emê baweriya xwe bi te bînin
û berdin bila lawên Israîl bi te re vegerin welatê xwe.
134- Lê gava me ew jê xelas kir û dema bi ih anîna
gotina wan hat, wan hextê xwe şikênand û/ ji gotina xwe zivirin.
135- Hemekî wan deren bi/ ayetên me ne didan dan û pê ne dibû
me tola xwe ji wan hilanî û me ew di behra Qulzimê de xeriqand.

98- Ma ew ewan dikarin/ Xwedê bizanin û jê ewle bibin
jê bi tenê mirovên ko/ rêya xwe winda rast kirine ewle ne.
99- Ma jiu ko cihê û melatê milletên winda bûyî girtine û mîratxwarên
wan bûne bû na bin ko heke me bixwesta em dikarî bûn
cezayên/ gunehê wan bidin û dilê wan mor bikin ta ko ew nikarin bibihîsin?
100- Em ji te re qisetên wan gundan dibêjin, ji wan re pêxember
Xuda bi mûcizan hatî bûn, lê wan berî hatina pêxember
deren bi ali Xuda ne didan piştî hatina wan ji dîsa deren bi ale
wan ne dan, hermeha Xuda dilê wan kafiran mor kirî bû/ dian
jî dilê mirovên ko baweriya xwe na yênin mor dike.
101- Me dît ko piraniya wan li ser benta xwe ne ma ne
û sot û qewa xwe şikênandine, ze bitirî wan fasiq in.
102- Piştî wan me Mûsa bi ayetên me şand nik Fîrewn
û seraket û xelkê wî, lê Fîrewn û peyayên di wî
Mûsa êşandin û binêre dawiya wan fesadkeran çito bû!
103- Musa got: Fîrewn, ez pêxemberê Xudanê erd û ezmana me.
104- Ez bi emrê Xuda pêxemberê wî me, ez di heqê Xuda de/ rastiyê
dibêjim, ji bal Xudanê me bi mûcizan hatim nik we, berde bila
lawên Israîl bi min re vegerin welatê xwe.
105- Fîrewn got: heke destê te de mûcize heye, û gotina rast e
ka mûciza xwe şanî min bide
106- Musa kopalê xwe avêt erdê,/ kopal bi rastî bû marek

107- Destê xwe ji berika xwe derênîst destê wî rohnak bû û biriqî
108- Mezinên xelkê Fîrewn gotin: ev sihirbazekî şehreza ye.
109- Gelî Qibtiyino.. ev sihirbaz dixwaze we ji welatê we derîne
berdiwa we ci ye, hon çi dibêjine?
110- Mezin xelkê Fîrewn ji Fîrewn re gotin: ji Musa û Harûn re mihlet bike/ me
bina mirovan xwe bişîne bajarên me ên mezin
111- bila hemî sihirbazên me ên hêja bikin.
112- Sihirbaz hatin nik fîrewn û gotin heke me zora wan bir
ji me re xelateke şahaşekî heye.
113- Fîrewn got: belê hûn jî ji ya nêzîkên min bibin.
114- Sihirbazan got: Mûsa.. tu destpê bikî an em,
ki alatên xwe ên sihrê bavê dayne erdê?
115- Mûsa got: hon destpê bikin û gava em aletên sihrê xwe dane erdê
tirs ket dilê xelkê, bu çavê wan rey bû, qey sihrekî mezin
bi ser wan de girtî bû..
116- Me jî wehî ji Mûsa kir ko ew darê xwe bavêje erdê, wî ew avêt erdê
kopal bi lez bi lez bû şahmarek û aletê sihirbazan daqurtand.
117- Rastî aşkera bû û kirina sihirbazan a bikin hate sist kirin.
118- Zora sihirbazan hat bû birin, şerpeze bûn û vegeriyan cihê xwe.
119- Sihirbazan secde kirin:
120- û got: Em me baweriya xwe bi Xudanê erd û ezmanan aniye,
121- bi Xudanê Mûsa û Harûn.

98– Ma em çawan dikarin / Xudê bizanin û jê ewle bibin
jê bi tene mûsenê ko / rêya xwe ya winda ji xwe re ji kirine ewle ne.

99– Ma gûh ko cihê ûmeletê winda bûyî girtine û mîratxwerên
wan bûne, hê na bûn ko heke me bixwesta em dikarî bûn
cezayê gunehê wan bidin û dilê wan mor bikin ta ko ew me karin bibihîsin?

100– Em ji te re qisetên wan gundan dibêjin, ji wan re pêxemberên
Xuda bi mûcizan hatî bûn, lê wan berî hatina pêxemberan
derew bi alî Xuda ve didan piştî hatina wan jî dîsa derew bi alî
wan ve dan, bi vî awayî Xuda dilê wan kafiran mor kirî bû / dike
jê dilê mûsenên ko bawerîya xwe na ynin mor dike.

101– Me dît ko pirranîya wan li ser benta xwe ne man e
û soz û qewla xwe şikênandine, ze bitirî wan fasiqin.

102. Piştî wan me Mûsa bi ayetên me şand nik Firewn
û serekên xelkê wî, lê Firewn û peyayên wî
Mûsa êşandin û binêre dawîya wan fesadkeran çi to bû!

103– Mûsa got: Firewn, ez pêxemberê Xudanê erd û ezmana me.

104– Ez bi emrê Xuda pêxemberê wî me, ez di heqê Xuda / de rastîyê
dibêjim, ji bal Xudanê me bi mûcizan hatim nik we, berde bila
lawên Israîl bi min re negerin miletê xwe.

105– Firewn got: heke destê te de mûcize heye, û gotina rast e
ka mûciza xwe nîşanî min bide

106– Mûsa kopalê xwe avêt erdê, / kopal bû marek
/ bi rastî

107. Destê xwe ji berîka xwe derêxist destê wî rohnak bû û biriqî.

108– Mezinên xelkê Firewn gotin: ew sihirbazekî şehreza ye.

109– Jêlî Qibtiyîno .. ew sihirbaz dixwaze we ji welatê we derîne
berdiwa we ci ye, hon çi dibêjine.

110. Mezin xelkê Firewn ji Firewn re gotin: jî Mûsa û Harûn re/ bişkik ne,
bira mûsenên xwe bişîne bajaran û em mezi

111 – bila hemî sihirbazên e ên hêja bikin.

112– Sihirbaz hatin nik Firewn û gotin heke me zora wan bir
ji mere şahaşekî heye.

113. Firewn got: belê bos jî peya xulamekên min bibin.

114– Sihirbazan got: Mûsa .. tu destpê bikî an em,
ki aletên xwe ên sihrê dayne erdê?

115– Mûsa got: hon destpê bikin û gava em aletên sihrê xwe dane erdê
tiş ket dilê xelkê, bu çavê wan reş bû, qey sihrekê mez.
bi wan re girtî bû..

116– Me jî wehî ji Mûsa kir dora ko ew darê xwe bavêje erdê, wî avêt erdê
kopal bi lez lezî bû şehmar û aletê sihirbazan da qurtand.

117– Rastî aşikar bû û kirina sihirbazan a bi ken hate sek kirin.

118– Zora sihirbazan hatî bû birin, şerpeze bûn û negeşan xwe

119 – Sihirbazan secde kirin:

120 – û got: Em baweriya xwe bi Xudanê erd û ezmanan anîye,

121 – bi Xudanê Mûsa û Harûn.

yê mûsenîno...
Xuda a
85– Bi tiş, derew û hîlebazîyê xelkê ji rêya / rastîyê şunda ve dûr neqe
randin, û ve xwazin ko xelk rêya / xwe a rast şaş bike, û bînin
bîra xwe, hon hindik bûn ve ji kerema xwe hon zor û zêçe
û rizqê me zêde kir û binêrin herças xwe, gelo
dawîya miletên ko fesadîyê kirî bûn çawan bû?

86– Heke hin ji we bawerîya xwe bi pêxemberîtîya min tînin
û hinên din inkar dikin, heta ko Xudê di nav hûn we de
hikmê xwe bide sebr bikin, ji ber ko hakimê çêtir Xuda ye.

87– Ji qewmê Şiêyib yên ko nefsmezin kirî bûn gotin:
Ho Şiêyib em ê te û mûsenên ko bawerîya xwe bi te anîn ji gundê
xwe derînin, meger ko hon li ser dînê miletê me vegerin!
Şiêyib got: em çawan dikan li ser dînê we negerin, em jê
ikrah dikin
Şiêyib got:

88– Piştî ko Xuda me ji dînê we xelas kirîye, çawan em dikarin
vegerin ser dînê we û derew bi alî Xuda ve bidin, em venagerin
ser dînê we meger ko Xuda / bixwaze û ji me re emir bike, zanîna Xudanê
me dora her tiştî digire, me xwe sipartîye Xudanê xwe,
Xuda di nav beyna me û we de bikira xwe bi gora rastî
û edaletî, Xudayê min hakimê çêtir û mediritir tu î.

89– Serekên qewmê Şiêyib ên kafir ji yên din re got: heke bizanin ko
heke we bindestîya Şiêyib kir yekcar zerer dikin.

90– Erd hejiha dilê wan perçiftî û, li ser rûyê xwe / ketin û mirin.
?
ziyanê wan getiya

91– Yên ko derew bi alî Şiêyib ve da bûn ji helikin û ji qey ji mala
xwa winda bûn, yên ko derew bi alî Şiêyib ve da bûn di dinya
û axiretê de ziyanker bûn.

92– Şiêyb dev ji qewmê xwe berda û got: qewmê min .. min
emrên Xuda şanî we da û şîret li we kir, êdî ji boçi ez xema
miletekî kafir bixwim.

93– Gava me ji gundekî re pêxemberekî dişand û wan derew bi
wî re didan me xelkê wî gundî bi dest tengî û nesaxîyê
diêşand ta ko ew bi bibin û nefsmezinîyê ne kin.

94– Piştre me ji wan re
bedila xizanîyê xweşî da û ew dewlemend bûne,
wê A çaxê man dîsa nefsmezinî kirin û gotin:
bav û kalên me jî bi zora xweşî û nexweşîyê tam kirine
lê em ji nişka ve ezabekî giran gihande wan û wan
bêr ne hiş bûm ko Xuda wan bigirine.

95– Heke xelkê gunda bawerîya xwe bianîyana û ji Xuda tirsîyana
bibana me ê ji wan re jî rizq û genciya erd û ezmanan
bidaya, lê ew / ferwekî derew bi alî pêxemberên Xudanê me
ew êşandine bi gora emdê wan êşandine.

96– Ma xelkê gunda bê na bin û na tirsin ji ezabê me ko
dikare bi şev, bi ser wan de bê..
/ gava ew radizin

97. Ma xelkê gunda ewle ne û na tirsin ji ezabê me ko dikare
di nav rojê de bi ser wan de bê.

**Gata Talanê**

Heftê û pênc ayet in di Medînê de dahatine

Bi navê yezdanê pak ê dilovan û mihrivan

1- Ji te pirsa hikmên talanê wê bikin, bêje talan di hikmê Xuda ‘u pêxemberê wî de ne , ew her wekî dixwazin talan dikin; Mirovîno ji Xudayê xwe tirsiyar bibin, li hev bên û xwe bispêrin Xuda û bêemriya pêxemberê xwe nekin. Heke we baweriya xwe aniye.

2- Ji ber ko bawermendên pak gava navê Xuda dibêjin ji mezinahiya wî dile wan tirsiyar dibe û gava ayetên Xuda dibihêsin baweriya wan hêj bêtir dibe û ew nefsa xwe dispêrin Xudayê xwe.

3- Yên ko radibin nimêjê û ji zade ko me da wan di riya Xuda de didin .

4- Ew bawermendên pak in , li ba Xwedê cihê wan bi derecaê mezin e ,gunehê wan wê bêne efîv kirin û ji bo wan zadê çak û pir heye.

5- Xuda bi rastî emir kiribu ku tu ji mala xwe derkevê û dest bi şer û kuştinê bikê, heke ji bawermendan hinek vî emrî necîbînin jî bi gora qerar û emrê Xuda bimeşe.

6- Her çend jî ji wan re aşikâre hate gotin emre Xuda ev e ko honê herin pêşiya dijminên xwe ,wan berberiya te dikir û riya xwe têr tirs û tomet dihesibandin. Û qey wan ji tirsa mirina xwe ber çavê xwe didîtin

7- Bîne bîra xwe … Xuda ji wan herduwan heke ji xwe re (…) karwanê xelkê Mekê ko ji Şamê dihat , an eskerên Mekê ko ji bo parastina vî karwanê ji Mekê derketibûn, kiribû qismetê we, divêya bû ,honê derkevin pêşiya yekê ji wan, her wekî bi karwanê xelkên bi çek hindik bûn wedixan? Honê pêşiya karwanê biigirin û ew bibe qismeta we û ew ji we re bibe û honê nexin pêşiya eskerê Mekê û bi wan dest bi şerî mekin. Xuda rastiya ayetên xwe şanî we dide û dixwaze qedrê misilmanîtiyê bilin û misilmanan serfiraz bike û kafiran jî reha wan biqelîne.

8- Ta ko misilmanîtî di dilê mirovan de xurt û qaim û qedrê wî giran bibe û kufir ji dinyayê rabe, her çend ji kafirên Mekê jê hez nakin.

9- Bînin bîra xwe gava we ji Xudayê xwe hêvîya arîkariya wî kir , wî li we vegerand û got : ez bi hezar melyaketên ko pey hev tên arîkariya we dikim.

10- Xuda bi xebera hatina milyaketan dixwest ji we re mizgîniyekê bide ta ko dile we bişide û hon şaşiyê bekin ; nisret ji ba Xwedê ye Xuda delal û fêris e.

11- Bîne bîra xwe …bi emre Xwedê bi xevekê sivik xeva we hat û hon razan dile we pê rahet bû ; û ji ezmên baranekê xweş dahat ta ko hon bo destlimêjên xwe rakir û paqij bibinû ji destê şeytên bifilitin û gotinên wî ên bêker nekevin sere we û hon dile xwe bi Xudayê xwe bigirin, pêşiya dijminên xwe de piyê xwe qaim bikin.

12- Xuda ji melyaketan re bi awayê wehyê got : ez bi we re me, arîkariya bawermendan bikin , û bi emrê min tirs dikeve dile kafiran , stuyê kafiran bişkînin û tiliyên wan jêkin;

13- Ji berk o wan neyartiya Xuda û pêxemberê wî kir her kesê ko bêemriya Xwedê û pêxember dike divê bizane ko ezabê Xuda giran e, Xwedê bi awakê xurt diêşîne.

14- Lezeta vî ezabê tam bikin û ji bo kafiran ezabê agirî heye.

15- Gelî bawermendîno … gava hon rastê kafiran tên ko xwe ji bo şer û kuştinê pêk anîne pişta xwe nedin wan .

16- Yên ko di roja qewiranandinê de ne ji bo xapandina dijminan , an arikariya şerkeran lê ji bo bazdanê pişta xwe dide dilminê xwe ,divê bizan Xuda jê dienire , ew dikeve dojehê, dojeh çi derekî têr şerm û ezab e.

17- We (…) bê Xuda ew kuştine, axa ko hate avê tin , ne we avêtiye, lê Xuda ew avetiye û pê dijminên we şikiyane, Xuda bi vî awayî nimeta xwe da we û talanê kafiran ket destê we. Xuda zana û bihistiyar e.

18- Ew nîmetên Xuda ne û Xuda hîla kafiran pûç dike. ,

19- Gelî xelkên Mekê …heke we qerara Xwedê û di şerî de nisret xwestiye , hon dibînin ne hon lê misilman serdest bûne û we hikmê Xwedê çi ye seh kiriye ,heke hon êdî dest ji şer û xirabiyê dikişînin ji we re çêtir e ,heke hon vedigerin meydana şerî ew jî vedigerin ; arîkarên web i çiqasê pir jî bin nisret nakeve destê we, Xuda bi b awermendan re ye.

20- Gelî bawermendino… bindestiya Xuda û pêxember bikin. û bêemriya wan nekin ,ji xwe hon hikmên Quranê dibihîsin,li gora emrên Quranê bimeşin.

21- Nebin mîna kafir û fesadkarên ko dibêjin me bihîstiye û na bihîsin.

22- Li ba Xwedê peyayên ker û lal ko rastiyê seh nakin ji dewaran kêmtir in.

23- Ew bikêr bihatana û Xwedê qenciya wan bixwesta ew bihistiyar bibûna ,lê heke Xuda ew bihîstiyar bikira û wan bihîstiyar bikira û wan bibîhistana jî dîsa dev ji dînê xwe berdana û ew ji riya rastiyê şunda wê vegeriyana.

24- Gelî bawermendîno… gava Xuda pêxemberê xwe ji bo vejandina dilê we ê mirî bi dîn û baweriyê banê we dike ,werin û bindestiya wî bikin, û bizanin ko di nav bira mirov û dile wî de cîhê sewiyaniya vXwedê heye û honê vegerin ba Xwedê.

25- Ji wê belayê bitirsin ko pê ne bi tene zaliman pê tene êşandin û bzanin ko ezabê Xuda giran e.

26- Gelî mirovên ko ji Mekê mihacir bûne , bînin bîra xwe, hon hindik û jar bûn û piraniya xelkê Mekê mişrik bûn, qedrê we nedihat girtin, hon ji mal û canê xwe ewle nebûn, Xuda di Medînê de cîh da we û bi arikarî û nisreta xwe wî hon xurt kir û rizq û zade xweş da we ta ko hon şikirdar bibin.

27- Gelî bawermendîno bêbextiya Xuda û pêxember mekin. (fotokopi derneketiye.s. ulugana) û bihemd mirovekî ko ji we re gotin an malekî emanet kiriye nexapînin û bextreşiyê lê nekin

28- Seba xweşiya jin û zaroyê xwe û zêdekirina malê xwe dest ji rastî û camêriyê bernedin û bizanin ko xweşiya mezintir destê Xuda de ye.

29- Gelî bawermendino …heke hon ji Xudayê xwe tirsiyar dibin Xwedê dile we digihîne ronî û rastiya xwe ,dê gunehên we bibore, hon tobedarê wî dibin û ew toban dide we,kerema Xwedê mezin e.

30- Pêxemberê min bîne bîra xwe… kafiran dixwest bêbextiyê li te bikin , te bi hîlan bigirin ,te ji welêt derînin ,te bikujin lê qudreta Xuda ji hîlekariya wan mezintir e ,di şerê Bedir de zora wan bir û wî ew zendemayî hişt, xudanê qudretê mezintir Xuda ye.

31- Gava ji wan re ayetên Quranê tên xwendin dibêjin , me bihîstiye ,heke we bixwesta em jî dikaribûn tiştên (pêşiyê) mîna wan pêk bînin ,ew çîrçîrokên dema berê ne.

32- Wan got : Xudayê me heke Quran heq e û kitêba te ye tu ji ezmanan keviran li ser me de bibarîne an bi ezabekî giran me biêşîne.

33- Pêxemberê min … her çend ji wan (…) ji ber ko (…) di nav wan de buye, Xuda dil nedikir wan biêşîne û Xuda naxwaze wan biêşîne çimkî di nab wan de mirovîn hene ko wê tobedar bibin.

34- Ma îmkan heye ko Xuda me ne ezibîne, her çend jî ew ne miteweliyên Mescîdê Heramê ne, bernadin ko misilman Mala Xwedê tewaf bikin; piraniya wan nezaniya xwe de ji xwe re dibêjin em miteweliyên Mescidê Heramê ne , kê miteweliyên wê bi tenê ewên ko ji Xudayê xwe tirsiyar in.

35- Ji dêla dud ve ibadeta wan di Mescidê Heramê de fêkandin û çepikan bû her wekî we di niho jî hon lezeta ezabî tam bikin.

36- Yên kafir ji xelkê re ji bona vegerandina wan ji riya Xuda peran didin ,bila bidin,di dawiyê de wê seh bikin ko toba wan bêkêr bû , ew dest bi ax û zarîyê bikin û poşman bibin û zora wan bê birin.

37- Yên ko kafir bûne di dojehê de wê bêne civandin.

38- Xuda çê û xerab ji hev dizane ,ew mirovên pak û bawermend ji yên neçaq û bêdîn ji hev dêgerîne Xuda xelkên neçak digihûre hev ewn wan kom dike û davêje dojehê û yên ko malşewitî ew in.

39- Pêxemberê min … ji kafiran re bêje : Heke ew tobedar dibin û dest ji şerî dikişînin gunehên wan ên borî tene efîv kirin. Lê heke ji nû ve destpê bikin her wekî me selfên beriya wan edimandiye wan jî diedimênin; heke wan dest bi şer û kuştinê dikin ,hon wan bikujin heta ko kes xelkê êdî pûtan ne din hevberî Xuda û her kes baweriya xwe bi yekitiya Xuda bîne . ger wan dest b ji kafiriyê berdan Xuda emele wan dibîne û lig ora qedê wan qedrê wan digre.

40- Heke wan baweriya xwe neanî û dest ji şerî ne kişandin, gelî bawermendîno,bizanin ko arîkarê we ê mezin Xuda ye, ji çêtir arikar û sermiyan e .

41- Bizanin ko ji talanê kafiran her çi jî dikeve destê we jê ji pênca yek (…) Xuda û pêxemberê wê û mirovên di wî û sewî ,belengaz û (…) ne ,heke we baweriya xwe bi Xwedê û bi ayetên ko me ji swê re da dahatin û bi muciza roja şerê Bedira ko gava hin rastî hev hatin me bi milyaketan arikariya evdê xwe û miletê kiriye û mirovên çê û xerab ji hev gerandiye. Xuda bi her tiştî dikare.

42- Bînin bîra xwe… gava hon bi qesda şerî hatin beriye, hon di nîzîki medînê de bûn, cîhê we erdeki têr sêlak û bêav derekî bîk bû ,dijminên we û xwe ji Medînê dûr bûn û cihê wan asêgehek û têr av bû. , xurtiya dijminên xwe bizaniya ,di mes da ? dema destpêkirina şerî hon bi hev diket û we biya hev û dû ne dikirin lê bi emre Xuda we lez û bez xwe di nav beyna we û kafiran de şer destpê kir û bi gora qerarê Xwedê her tişt qewimî. Emr û qerara Xwedê şikestina dijminan û nisreta web û.

43- Piştî dîtina delîlên eşkere yên ko di kufrê de pê didin erdê bila kafir bimirin û yên din ko çav û dile xwe vedikin û rastiyê dibînin, divê baweriya xwe bînin û xwe bizanin ko Xuda bihistiyar û zana ye.

44- Pêxemberê min , bi emre Xwedê te di xewna xwe de didît ko dijmin hindik in, heke te bidîta ko dijmin zehf in, tirs wê biketa dile mirovên te û wan di qerara destpêkirina şerî de biya hev û du nedikirin, Xuda bi wê hemayî ew ji tirsê parast ji berk o Xwedê veşartiyên (dile) hindura mirovan nas dike.

45- Bînin bîra xwe … gava hon rastî dijminên xwe hatin we ji xwe re digot qey hindikin ,ji ber ko ew pêş çavê we de hindik xuyanî dibûn bi emre Xuda cavê dijminên we hindik didîtin. Bi wî awayî tirs neket dile we û hon bi hew re dest bi şer û kuştinê kirin ta ko qerara Xuda bê cih û, misilman serdest û mişrîk sefîl û perişan bibin; her tişt vedigere ba xwedê.

46- Gelî bawermendino… gava dijmin dirêjî we dikin xwe sist û pîs mekin bi mêranî dest bi şer bikin, pişt pehniya xwe li wan mekin. . pê bidin erdê , Xudayê xwe bînin bîra xwe û arîkariya wî bixwazib ta ko serdest bibin.

47- Bindestiya Xuda û pêxemberê wî bikin, (…) hev û dû mekin, bi hev ne kevin, heta kot irs nekeve dile we û bihna we ne çike û xudan sebir (…) û bizanin ko Xuda arikariya mirovên xudan sebr dike.

48- Ne bin mîna mirovên ko her çi tê ser zimanê xwe di bejin û ne li gora pesna xwe ne, kê seba xapandina xelkê,ji welatê xwe derdikevin, xwe dibînin , nefsmeziniyê dikin û xelkê ji riya Xwedê şunda vedigerînin Xwedê emele wan dizane ,zanîna Xuda her titî digire.

49- Bînin bîra xwe …mişrîkan neyartiya pêxember dikir, şeytên ew di pesinand û ji wan re digot îro kes nikare zora we bibe ,ez ê web ikim, lê gava mişrîk û misilman gihaştin hev û dema şerî nêzîk bû ,şeytan pişt pehniya xwe li wan vekir , ji (…)

xwe zivirî û ji mişrîkan re got : nav beyna min û we de tu hevalbendî nîne, min destê xwe ji we şuştiye ji berk u tiştin hene ko ez dibinim lê hon na bînin,ez ji Xuda tirsiyar im, ezabê Xuda giran e.

50- Mirovên ömişrîq û dilreş got : tu melyaket nehatiye arikariya wan, dînê wan ew xapandin, lê ne we re ye , yê ko xwe diaspêre Xwedê divê bizane ko Xuda fêris û delal e.

51- Te bidîta melyaket di roja şerê Bedirê de çawan li pêş û paş û li rû û pişt kafiran ko dihatin kuştin dixistin û ji wan re digotin de niho lezeta agirî tam bikin

52- Her wekî wan şer kir û mala xwe bi destê xwe xirab kir ezabê (…) bû, an ne Xuda bê sebeb evden xwe na êşîne.

53- Ew mîna miletê Firewn û yên berî wî ne ko ay Xuda inkar kirin û pê kafir bûn û ji ber wê yekê Xwedê li wan û ew ji binî hatine qelandin, Xuda xurt e û bi awakî giran diêşîne.

54- Ji xwe Xwedê kerema xwe ji serê mileteki kêm nake meğer ko ew milet bi xwe ji riya rastiyê derkeve û nefsa xwe xira bike , Xwedê bihistiyar û zana ye.

55- Mîna miletê Firewn û yên berî wî ko derew bi alî ayetên me ve dan me ew seba kufrê wan edimand û miletê firewn jî di avê de fetisand, ew hemî mirovên zalim û xedar bûn.

56- Mirovên kafir li ba Xwedê ji dewaran kêmtir in û ew baweriya xwe nayînin.

57- Yên ko doz û wad didin hev û amîniya? xwe pê tînin û pişt re jê vedigerin, ji Xuda natirsin; bêhest in

58- Heke te di şerî de zora wan bir, tu wan biêşîne û heçî ko bêbextî kirine wan ji hev bela bike ta ko mirovên din jê bitirsin û êdî bêbextiyê nekin.

59- Heke tu dihesî ko miletekî soz û qerara xwe a ko daye û wê bişkîne , beriya ko tu dirêjî wan bikî qerara xwe ji wan re bide zanîn, Xuda ji bêbextan hez nake.

60- Kafirên ku di şerê Bedirê de ji destê me filitîne şa nebin , her hal wê bêne êşandin.

61- Bi çiqasî ji we tê tîr û kevan û şûr û mertalan û hespên çak û baş xweyî kirî kom bikin heta ko ji xurtiya we tirs bikeve dile dijminên Xuda û dijminên we û ji wan pê ve dile dijminên ko hon nas na kin lê Xwedê nas dike. Her tiştê ko hon di riya Xwedê de didn ji we re sewaba wî heye û ji we re tu neheqîtî na yê kirin.

62- Heke ew dest ji şerî dikişînin û dixwazin bi te re lihev bên tu jî wan re li hev were û xwe bispêre Xwedê û bizane ko ew bihistiyar û zana ye.

63- Heke ew dixwazin te bixapînin bizane ko Xwedê besî te ye, Xuda bi nisreta xwe û bi şerkerên misilman tu xurt kiriye û we dile misilmanan li hev aniye ,heke ji emre Xuda ne buna te malê dinyayê bidaya jî dile wan li hev ne dihat, lê Xudan ew bi hev anî ,bizane ko Xuda delal û fêris e.

64- Pêxemberê min … Xuda berî te û berî bawermendan ê ko bindestiya te dikin

65- Pêxemberê min… ji bo şer û kuştinê dilê mirovên xwe bişidîne ,ew bila bizanin di şerî de bîst peyayî di wan ên xudansebir zora du sed kafiran û du sed peyayên wan zora hezar kafiran dibin, ji berk o kafir Xuda û roja piştdaniyê nas nakin

66- Yên wekî Xuda dizane ko dile me de sistî heye barê we sivik kiriye, sed peyayên we ên xudan sebir zora du sed kafiran dibin,û hezar peyayên web i destûra Xwedê zora du hezar kafiran dibin û binerin Xuda arîkare mirovên Xudansebr e.

67- Bi tu pêxember nakeve ko ew ji exsîran fidye bistîne û wan berde ,kafir divê ji ber xurt û serfiraziya islamiyetê bêne kuştin gelî bawermendino hon lavêkarê malê dinyayê ne lê Xwedê dixwaze we bigihîne xweşî û dewlemendiya axiretê,Xuda delal û fêris e.

68- Heke li ba xwedê hikmê afiwkirina gunehên mirovên ko bê hemdê xwe gunehkar bûne ve hate nivîsandin yên ko di şerê Bedirê de exsîra berdane û fidye standine bi ezabekî mezin wê bihatina êşandin.

69- Ji talanê kafiran her çi dikeve destê we bibin û bi destxweşiyê bixwin ew ji we re helal e û ji Xudayê xwe tirsiyar bibin û bizanin ko Xuda di gunehên we dibore, Xwedê dilnezm e.

70- Pêxemberê min… bêje ji exsîran re ko ketine destê we û fidye dane : heke lig ora emre Xuda dile we bawer dike û qenc e bizanin ko Xuda ji fidye ko ji we hate standin hêj zêdetir dide we û di gunehên we dibore ,Xuda tobe dide , Xuda dilnezm e.

71- Heke exsîr piştî ko ji wan re bert hate dayîn bê bextiyê bi te dikin bizane ko wan bere jî bextreşî kiribûn û ew dîsa bikevin destê we û bin hikmê we. Xuda zana û fêris e.

72- Yên ko baweriya xwe bi Xuda û pêxember anîne û ji Meke mihacir bûne û hatine Medînê û di riya Xuda de bi mal û canê xwe cihadê kirine û yên ko mihacira cem xwe ciwandine û di şer û rahetiyê de arikariya pêxember kirine ew dê mîratxwarê hev in; lê yên ko her çend jî baweriya xwe anîne lê mihacir nebûne ji Mekê derneketine û ne hatine Medînê,hon û ew mîratê hev û dû na xwin, ne mîratxwarên hev in ,heke ew mirovên di we ne jî ,meğer ko ew jî wê mihacir dibin û ji Mekê tên Medînê. Heke Misilman ko ji Mekê derneketine di şer û kuştinê de kafiran dê arikariya we dikin, divê hon jî arikariya wan bikin meğer ko ew neyartiya miletekî dikin ko di nav beyna we û wî miletî de doz û wad heye,wê gorê nabe ko hon doz û peymana xwe bişkînin dirêjî wî miletî bikin.Xuda tiştên ko hon dikin dibîne

73- Yên kafir miratxwarê hev in, misilman na be ko têkilê wan bibin, ko we bêemriya Xwedê kir, di nav dinyayê de fesad û fitneyeke mezin çêdibe.

74- Yên ko baweriya xwe bi Xuda û pêxemberê wî anîne û mihacir bûne, ji Mekê hatin Medînê ,û di riya Xwedê da bi can û malê xwe cihadê kirine û yên ko mihaciran li cem xwe hewandina û di şer û rahetî û aşîtiyê de arikariya Pêxember kirine ew bi

rastî bawermendên pak in, Xuda di gunehên wan diborin û ji bo wan xweşî û nimete mezin heye.

75- Yên ko piştî mihacir bûn ew baweriya xwe anîne û ketine mihaciriyê û di şer û kuştinê de arîkarên we bûne ew jî ji me ne û di mîratxwariyê de hon mirovên di nav (…) din zanin ko Xuda her tiştî dizane.